





ŞÊWRDARIYA RUH'ANIYA ÊZDIYAN LI GURCISTANÊ

NAVENDA LÊK'OLÎNÊD ÊZDÎTIYÊ



DUA'YÊD ÊZDIYAN



Publishing House
"UNIVERSAL"
T'bilîsî 2018





ШЕУРДАРЬИА РӨН'АНЬИА ЭЗДИАН ЛЬ ГӨРЩЬСТАНЕ
НАВӨНДА ЛЕК'ОЛИНЕД ЭЗДИТЬЕ

ДӨА'ЙЕД ЭЗДИАН

Т'билиси

2018



Ev p'irtûk bi alîkariya madî ya Qulîxanê Ah'med
Bêmalyan (Xaltî) hatiye çap kirin.

Әв п'ьртук бь алиқ'арьяа мади йа Қөлихане Ан'мәд
Бемалйан (Халти) һатыйә чап кьрын.


© SPIRITUAL COUNCIL OF YEZIDIS IN GEORGIA, 2018

Publishing House "UNIVERSAL", 2018

19, I. Chavchavadze Ave., 0179, Tbilisi, Georgia ☎: 2 22 36 09, 5(99) 17 22 30
E-mail: universal505@ymail.com; gamomcemlobauniversali@gmail.com

ISBN 978-9941-26-246-3

DUA'YÊD ÊZDIYAN



PÊŞGOTIN

Dua' – anku gazîkirin û bang kirina bo Xwedê, k'îjan jî ji zemanê berêda xas û qelendara, pêxembera û weliya bo Xwedayê Mezin dikirin. Bi baweriya êzdiya Xwedê yeke û her kesek bi zimanê xwe gazî Wî dike û çî dilê merivanda heye dixwazin ji Xwedê. Hinek medh û payî didin Xwedê, hinek bi hîvîyekî û xwastinekî gazî Wî dikin. K'ê çawa dikare bi gotin û peyvê xwe dua' dike û P'adşayê xwera xeber dide. Çawa qewlê meda tê gotinê, Xwedê her tiştî dizane, ew haj nêt û meremê her merivekî heye û dilê her kesekîdane. Em çî ji wî bixwazin û çî bo Wî bêjin, tişteke ji wî nayê veşartin. Di Medh'ê Xwedêda tê gotin:

Tu t'am û k'am û r'ay

Ya R'ebî, her tu Xwedayî

Her tu h'ay

Û her tuyî layîqî medh û senayî

Yanê, em borcdarin hero gazî Xaliqê xwe bikin û şikirbûna xwe bidine wî ku dîsa carekî me dinya r'on dît û dua' bikin ku e'dlayî û aştî hebe dinê da, şer û de'w t'unebe, hezkirin û muh'ubet hebe dilê merivanda. Em dikarin dua'yê xwe bi dil û can bi peyv û xeberê xwe bêjin, lê her usa jî hene têkstên dua'yan k'îjan jî êzdî dikarin ezber bikin û dua'yê xwe bi cî bînin. Li gorî qanûn û e'detê me êzdiyan dua'yê sereke hene, k'îjan jî her kesekî êzdî gerekî bizanibe. Hene meriv k'îjan jî herr'o dua'yê kurt dixûnin, hene k'îjan jî dua' bi gotinên

xwe dibêjin û hene yê usa ku têkstê dua'yan bi temamî ezber kirine.

Bona êzdiya ya herî muhîm û e'seyî Şehda dînê xwe bizanibe, li k'îjanîda jî bi kurtayî behsa dînê me tê kirin, ku em Xwedayekî dih'ebînin û navê xasêd me, navê meleka û ciyê meye pîroz tê gotinê. Herwisa varîyanteke Şehda dînî ser belgî, pêşiya r'azanê tê xwendin. Mezinê me gotine ku xew û mirin wek hevin û meriv berî r'azê gerekî dua' xwe bike û ruh'ê xwe h'alal bike.

Her usa ser me ferze em şebeqê sibê zû dua' xwe bikin û li ber r'ojê perwesta bin, çimkî li gorî baweriya me r'oj (tav) nûra Xwedêye. Xwedê nûre, kesî Xwedê nedîtiye û çaxe sibê zû r'oj hiltê em berê xwe didin r'ojê r'ojhilatê û ber nûra Xwedayê mezin sicûde dibin. Sibê şebeqê Dua' Fecrê tê xwendin û paşê Dua' Sibê. Her wisa em dua'yê xwe êvarê, berî r'oj here ava dikin.

Êzdî bona duakirinê gerekî xwe hazir bike, dest û ç'avê xwe bişo û ciwan bike, paşê desmalekî yan k'um bide serê xwe, destê rastê bide ser destê ç'epê, berê xwe bide rojê û pêxwas li ser linga dua' xwe bike.

Her merivek di e'mrê xweda xêra jî dike û guna jî dike û em ji Xwedê dixwazin gunê me e'fû bike, ji me bibexşîne. Bi baweriya me Xwedayê Mezin bi gelek libasa, bi gelek nava û bi gelek r'enga xwe nîşanî me kiriye. Êzdî bawer dikin, ku sê navêd mezin hene ku me Xaliqê xwe nas kirîye: Tawisî Melek, Siltan Êzîd û Şîxadî.

Xwedê ev dinya ji hezkirin û muhubeta xwe xuluqand, ji nûra xwe heft milyaketêd k'ibîr afirandin û bi navê Tawisî Melek bû mezinê hemû milyak'eta. Herwisa jî bi navê Siltan Êzîd jî xwe dahir kiriye dema dinya diafirand. Navê sisayê

mezin Şixadiye û bi vî navî wî riya Xwedênasiyê nîşanî me kirîye, u'lm û zanîna xwe da destê şagirdên xwe, xas û qelendera, derwêş û weliyan, kîjana jî ev zanebûna k'ûr dane miletê me û h'eta nuha em ser r'iya xwedênasiyê mane. Em bi r'iya wan xas û qencêd Xwedê yê ku Xwedê qewat û kiryamet dabûne wan gazî Xaliqê xwe dikin. Wan em hînî dua' kirine û em pey r'iya wan diçin heta nuha. Û lema di dua'yêd meda gelek car navê qencêd Xwedê, xasa, meleka, p'êxembera tê gotin. Êzdî qedrê p'êxemberê hemû dîna digrin. Duya'ê meda navê Birayîm Xelîl, Îsa, Mûsa û yê din jî derbas dibe û ev nîşana vê yekêye, ku êzdî qedr û hurmetê digrin bona dînê xelkê.

Dua'yêd êzdiyan bi p'iranî bi zimanê êzdîkî (kurmancî) hatine gotin û vehûnandin ji aliyê qencêd Xwedê, xas û weliyava. Her wisa hene dua', k'îjan jî bi zimanê e'rebî hatine gotin, çimkî zimanê e'rebî di wextê xasê me dahir bûne, zimanekî navmiletîyê bû û zimanê u'lm û xwendinê bû. Bi baweriya êzdiyan, meriv bi çî zimanî jî dua' bike Xwedê dua'yêd wî qebûl dike. Lê ji berku ev dua' ji aliyê xasê me da hatine gotin, guneye em wan biguhêzin û destekariyê di nav da bikin. Hêjayî gotinêye, ku zimanê dua'yan gelekî kevne û fehm kirina me'niya wan girane bo merivên ku dest bi hînbûnê dikin. Di vê pirtûkêda me têkstên dua'yan bi sê elifbeyan çap kiriya: h'êrfên êzdikiya kevin, latînî û kîrîlî. Me ev bo vê yekê kirîye, ku xwendevan bikaribe hersê elifba nas bike û k'îjan jî jêra hêsaye bi wan h'êrfan bixûne.

Em hîvîdarin ku ev pirtûka ber destê xwendevanan wê alîk'ar be bo êzdiyêd xweyî îman û bawermend. Çend dua'yêd sereke me kiriye vê pirtûkê da ku herr'oj êzdî bikarin dua'yêd xwe pê bikin.

MEDH'Ê XWEDÊ¹

Ya R'ebî, e'la şanek û e'la mik'anek û e'la siltanek

Ya R'ebî, tuyî k'erîmî tuyî r'eh'imî

Ya R'ebî, her tu Xwedayî

Her tuyî layîqî medh' û senayî

Ya R'ebî, tu melekê melkê cîhanî

Ya Rebî, tu melekê melkê k'erîmî

Tu melekê e'rşê e'zîmî

Ya R'ebî, ji enzelda her tuyî qedîmî

Tu t'am û k'am û r'ay

Ya R'ebî, her tu Xwedayî

Her tu h'ay

¹ Ev têkst medh û pesnê Xwedê dide. Êzdî bawer dikin ku Xwedê yeke û wî ev dinya çêkiriye. Her care meriv dikare medhê Xwedê bide û ev dua' bê xwendin.

Û her tuyî layîqî medh' û senayî

Ya R'ebî, tu melekê ins û cinsî

Ya R'ebî, tu melekê erş û kursî

Ya R'ebî, tu melekê gay û masî

Ya R'ebî, tu melekê alem û qudsî

Tu el- semedî li liftî lemayî

Tu el- semedî hey el mecîdî

Wahidî ferz el- hemîdî

Ya R'ebî, tu xudawendê sepehrî

Ya R'ebî, tu xwedanê meh û mehrî

Ya R'ebî, tu xudawendê e'tayî

Ya R'ebî, tu layîqî medh' û senayî

Ya R'ebî, ji îsma tuyî bilindî

Te ne çone, tuyî çendî

Nezayî nezayî tu zendî

Miqadeste du p'ayî
Tuyî layîqî medh' u senayî
Ya R'ebî, te k'erem daye h'ûtî
Min daye qutî, h'elimî melkûtî
Ya R'ebî, tu a'limê u'limayî
Ya R'ebî, tu him h'ekîmî û him mecalî
Ya R'ebî, te ne xafe, te ne xwerde
Xwedan malî xwedan p'erde
Ya R'ebî, mikanê te wê li h'emû e'rde

Ya R'ebî, te ne lewne, te ne renge

Te ne awaze, te ne denge

Te ne îndame, te ne ç'enge

Ya R'ebî, kes nizane tuyî kusayî

Ya R'ebî, tu welîyê ferza- nimêjî

Ruh'a diperêjî

Ji milan melean dipêjî

Ya R'ebî, tu h'akimê şah û gedayî

Ya R'ebî, tu h'akimê cimletî alem
Ya R'ebî, te t'obe danabû li ser Adem
Ya R'ebî, tu h'akimê şifayetê
Ya R'ebî, tu reh'mî, k'eremî, emînî
Ya R'ebî, tuyî el - semedî, em çu nînin

Ya R'ebî, ezî k'etîmey t'awîme
Tu him dermanî û him dewayî
Tu him dermanî û him tebîbî

Tu h'ekîmî, em xerîbin
Ya R'ebî, her tu dizanî dermanê me bi ku dibe
Ya R'ebî, tu unsê xurbayî

Û li suc û guneh û mişewşe
Me kirin the'iyat û gewşe
Ya R'ebî, li me bibexşe

Ya R'ebî, her tuyî hay
Û tu Xweday

Û her tuyî layîqî medh' u senayî

Ya R'ebî, tu xaliqî, em muxliqin

Tu mirazî, em daxwazin

Em kêmin û Şîxadî temame



ŞEHDA DÎNÎ²

Şehda dînê min yek Ela,
Melek Şêxsin heq h'ebîbella,
Meqlûbê, Mergehê sela.

Silavê li Meqlûbê, li Mergehê,
Li Lalişê xudanê qubehê, li ciyê mehê, binî mehê,
Li wî cî, erdê Êzîdxan ser dikêşe ber Şîxadî e'badetê û
sicûdeyê.

Şîxadî p'adşaye,
Şêxûbekir mewlaye,
Min şehda û îmanê xwe bi navê wan daye.

Şîxadî x'efûre,

² Her êzdîkî gerekî şehda dînê xwe bizanbe. Bi qîrara dînê êzdiyan, êzdiyê şehda dînê xwe nizanibe nayê hesabê êzdîkî rast.

Melek Şêxsin mişûre, Şêşims nûre,
Min şehda û îmanê xwe pê qebûle.

Nasirdîn celadê serê mine,
Mîr Sicadîn qasidê ruh'ê mine,
Qubletilbidor qubleta mine.

K'af û mixar û Zimzim h'eca mine,
Kaniya Sipî mora mine,
Tawisî Melek şehde û îmanê mine.

Siltan Êzîd atqata mine,
Şêşims mesebê mine,
Şerfedîn dînê mine.

Melek Fexredîn hostayê mine,
..... şêxê mine³,
..... pîrê mine,
..... merebîyê mine,

³ Li virda her kesek navê şêx û p'îr û merebî û terîqê xwe dibêje.

..... axreta mine,

..... xudanê mine.

Minetk'arim ji minetê,

Ez vavartim ji k'afira û şerîe'tê,

Elh'emdilla û şikir, ez avêtime ser p'îşka sunetê.

Minetk'arim ji Adîya,

Ez vavartim ji r'afidîya,

Elh'emdilla û şikir, ez avêtime ser p'îşka sunîya.

Minetk'arim ji mîra,

Ez vavartim ji k'afira û vavîra (xinzîra)⁴,

Elh'emdilla û şikir, ez avêtime ser p'îşka şêx û p'îra.


Ji Adîya minetk'arim,

Bi şêx û p'îr û hosta û merebî û yar û birê axretê,

Ber nav û dik'arê Siltan Êzîdê şîrînî şerîf ezî xundk'arim.

⁴ Di varyantekîda peyva xinzîr tê bi k'ar anîn, çî jî tê me'niya merivên bêbawer, serh'îşk û xafil.

Çûme Lalişa nûranî,
Min serê xwe li wan qub û hilêla danî,
Ya Şîxadî, tu k'ul û e'melê min dizanî,
Ya Xwedê û Şîxadî, em kêmin, tûyî t'emamî.



DUA' TOKÊ⁵

Toke û meftûle, xelatekî meqbûle,

Li nîveka t'ac û *resûle*,

Me bi serê xwe qebûle.

Şîxadî x'efûre,

Melek Şêxsin mişûre,

Xidir Eylas x'ewasê beh'rê k'ûre.

Şêşims ç'iraye û nûre,

Xwedê nûr e'la nûre,

Me toka xwe bi navê Tawisî Melek û Siltan Êzîd qebûle.

Em kêmin û Şîxadî t'emame.

⁵ Ev dua' tê xwendin çaxê meriv paşî serşûştinê kirasê xwe li xwe dike. Her êzdîkî gerekî kirasê sipî bi p'êsîr anku bi tok li xwe ke.

DUA' PIŞTIRÊDANÊ⁶

Ya Şêşims, mehdereke xêrê ji te dixwazim,
Yek şefaet, yek k'eramet,
Yek zar, yek ziman,
Yek fehm, yek aqil,
Yek dîn, yek îman.

Ya Şêşims, tu fehm û aqila di serê me bike,
Tu pirsyareke xêrê li h'alê me û vî miletî bike.

Ya Şêşims, tu bidî xatira delîl û xelîla,
Alayên delîl,
Axirê zemana Hesênê zerbaba.

Def û şibabe, xas û qelendere,


⁶ Ev dua' tê xwendinê dema meriv sibê zû radibe û kincê xwe li xwe dike.

Sura muxfi pê P'ira Selatê.

Dikra Dindilî rehman, Canê bin kehîm,

Eswedê Berlîm,

Ya Şêşims, min pišta xwe bi te girêda.



DUA' FECRÊ⁷

Mêr û meleka din medeh'a,

Û xasêd nava qubeha,

Ronayî dabû berê sibeha.

Ronaya berê sibê dahir bû,

Bor li e'badetê siwar bû,

Sed xweziya wî mêrî bi heq rawesta bû.

Aşiq û ma'şiq mifte bi deste,

Me miraza xwe ji wan dixwaste.

Ya rical al-sibah sibah' al-cedîd,

Ya melek şehîd, ya nefes Siltan Êzîd,

Ehed lih'ed ma yûrîd, ente al-şêx, ana mûrîd,

⁷ Ev dua' tê xwendin dema meriv berbangê radibe, dest û ç'avê xwe ciwan dike û berê xwe dide r'ojhilatê.

Ana radî k'ama ente tûrîd,

Al-mefer Siltan Êzîd.

Ya rical al-sibah' sibah' al-mşûqlîn,

T'ac al-ewlîn h'eta bi axirîn,

Xêra bide, şera wergerîn,

Heq elh'emdilla ya R'ebil a'lemîn.


Feqîr li a'lî, mîr li weh'danê,

Ya R'ebî, t'eqabil dûa'îna an dûa',

Al-mû'mînîn al-salihîn al-ihtiyazîn,

Al-mixfîn e'la abwab al-xasîn,

Ellahûm amîn.



DUA' SIBÊ⁸

Amîn, amîn,
T'ebarek li dîn,
Ella eh'sen li xaliqîn,
Bi h'îmeta Şemsedîn, Fexredîn,
Sicadîn, Nasirdîn,
Şêşims qewata dîn,
Siltan Şîxadî t'acê ewilîn h'eta bi axirîn,
Heq h'emdillah ya R'ebil a'lemîn,
Xêra bide, şera wergerîn.
Bi reh'ma Şîxadî, reza Melek Şêxsin, k'erema Şêşims.

Nûr ji nûrê şifiqî,
Sibh'ane ji te xaliqî,
Melek li ber t'ifiqî.

⁸ Ev dua' tê xwendin çaxê meriv sibê zû r'adibe, sibe safî dibe û berê xwe dide r'ojê.

Ji malê h'eta malê,
Şêşims xudanê sîqalê,
Em li Şêşims nabirin xiyalê.

Ji derecê heta derecê,
Şêşims xudanê ferecê,
Em dê dest û damanê Şêşims tewaf bikin di şûna
Ka'ebetillhayê û h'ecê.

Ji stûnê h'eta stûnê,
Çend mifte hene li hindurê xezînê,
Ya Şêşims, te dane destê xudanê me'rifet û nasînê.

Ji ç'ava h'eta devî,
Mora Şêşims lê dik'evî,
Meydana mezina ji k'erema nahêlin binivî.

Ji serî heta p'îya,
Ya Şêşims, te neqşandin danîne serê r'îya,
Em ji Şêşims nabirin hîvîya.

Ya Şêşims, tu li me veke dergehê reh'metê,

Te em î nabûne ser vê xilmetê,

Ronayîkî vêxe li ber me û çendî sunetê.

Sûnî ku sunîne,

Zebûnin di mandîne,

Me bi Şêşims hîvîne.

Sunet ku sunete,

Zebûne kêmtaqete,

Me bi Şêşims e'ynete.

Çi duaya Extiyarê Mergehê kirî,

Cêşê Melek Fexredîn, qewalê Şîxadî,

Dua'qebûl P'îrê Libna,

Wan çi dua' kirî, me ew dua' kirî.

Em kêmin, Şîxadî t'emame.

DUA' ÊVARÊ⁹

Ya siwarê r'ojhilatê û r'ojavayê,
Hûn bidine xatira dotê û dayê,
Hûn me xilas kin ji qedayê, ji belayê,
Ya Şêşims, tu li h'alê mala xwe bipirsî û me jî vê carê.

Hûn bidine xatira e'rş û k'ursî,
Ga û masî, heyat li kursî,
Ya Şêşims, tu li h'alê mala xwe û me jî bipirsî.

Hûn bidine xatira sur'a lewh' û qelema,
Hewa û Ademe, Îsa bin Meryeme,
Ya Şêşims, tu li h'alê mala xwe û me jî bipirsî li hemû dema.

Hûn bidin xatira çerx û feleka,

⁹ Ev dua' êvarê, berî r'oj here ava tê xwendin.

Horiya û meleka,
Sur'a Tawisî Melek û çarde tebeqa,
Ya Şêşims, tu pirsiyareke xêrê li mala xwe û me jî bike.

Hûn bidine xatira behîştê û darê,
K'afê û mix'arê, sur'a Êzîd û Beyt'ilfarê,
Ya Şêşims, tu pirsyarîyeke xêrê li mala xwe û me jî bike vê
carê.

Hûn xatira dur'ê kin, k'asê kin,
Extiyarê sur'a muxfî pê P'ira Selatê kin,
Ya Şêşims, hûn pirsyareke xêrê mala xwe û me jî bikin.

Hûn bidine xatira dur'a sipîye,
Melekê bêrîye, sur'a Êzdîye,
Ya Şêşims, li dîwana Siltan Şîxadî bo mala xwe û me jî bike
hîvîye.

Hûn bidine xatira dur'a sore,
Êzdîne Mîr û Qubletilbidore,
Ya Şêşims, bang û hewara me bê melekê jore.

Hûn bidine xatira dur'a zere,
Ax û av û ba û agire,
Êzdîne Mîr û her çar sur'a,
Ya Şêşims, tu li bangîna mala xwe û me jî were.

Hûn bidine xatira Sûka me'rîfetê,
Mêrê li ber bedlê dîke xilmetê,
Derwêşê şev û roj dîke e'badetê,
Şêx û p'îr, hosta û merebî, yar û birê axretê,
Ya Şêşims, meferîyekê mala xwe û me jî bike vê carê.

Hûn bidine xatira dua'yêd feqîra
Û r'ebenêd binê dêra,
Ya Şêşims, tu mala xwe û me jî bikî sexbêre.

Hûn bidine xatira k'ursiya reh'mana,
Melekê cana, beh'ra quds sibh'ane,
Ya Şêşims, me ji te divêt dîn û îmane.

Hûn bidine xatira E'zrayîl, Cibrayîl, Mikayîl,

Şifqayîl, Derdayîl, E'zafîl, E'zazîl,

Evin her heft melekêd k'ibîr,

Desta da mifte û k'ilîl,

Ew jî sekinîn li ber h'izreta melekê celîl.

Em kêmin û Şîxadî t'emame.



ŞEHDA DÎNÊ ÊZDIYA (DUA' SER BELGÎ)¹⁰

Serê min ser be'lgî,
Belgîyê min berê şibakê,
Sêrî çûme zikakê,
Bidî xatira Êzîd û makê,
Serê min qublet, berê min r'ojhilat,
Ser minra sekinî du celat,
Go: „Miskîno, Tajdîno, benîyo,
Şehda dînê xwe bîne,
Ezê serê te hilînim“.
Go: „Şehda dînê min yek Ela,
Melek Şixsin heq hebîb Ela,
Mergeyê, Meqlûbê sela,
Selayê, binîmeyê,
Ciyê Şerq û Şam êzdîxane lê dike sicûdeyê
Sicûda me diçe bal Şixadî,
Şixadî r'edayê,

¹⁰ Ev varîyanta şehda dînî berî meriv r'aze tê xwendinê.

Şêşims melk'ê mêrayê,
Şîxadî ser k'ursî westayê,
Şehda dînê xwe heq bi navê Êzîd dayê,
Sunîme, sunetnebîme,
Bi şêx, p'îr, hosta, merebî, yar û birê axretê me,
Mirîdê Şîxadîme,
Silavkêşê Kaniya Sipîme,
Bi qelema Melek Şîxsin nivîsîme,
Elh'emdila, ez êzdîme, ji dînê xwe razîme.
Nasirdîn – celatê serê mine,
Şêşims – mesebê mine,
Laliş û Zimzim – h'eca mine,
Kaniya Sipî – mora mine,
Siltan Êzîd – atqata mine,
Şerfedîn – dînê mine
Tawisî Melek – îmana mine.
..... – şêxê mine,
..... – p'îrê mine,
..... – merebîyê mine,
Reh'me li dê û bavê hosta.
Em kêmin, Şîxadî t'emame.

DUA' SIFRÊ¹¹

Ya R'ebî, tu dayîmî, tu k'erîmî
Tu reh'îmî, tu melkê erşê e'zîmî
Ji ezelda tu qedîmî
Xwedêo, tu heftê û du miletî bêyî reh'mê
Serê ser be'lgîya, girtîyê h'ebîya
R'êwîyê r'îya, k'esîb, belengaz û êxsîra,
Me jî pêra.
Hûn bi maş bin, bi berat bin, bi xelat bin
Bi kur û qîz û mal û dewlet bin
Bi îman û erk'an û axret bin
Xem nebî, dem nebî
Rizqê we û hadir-guhdêra kêmb nebî
Sîyar bûyî peya nebî
Ya dîtî mehrûm nebe

¹¹ Ev dua tê xwendin paşî xwarinê wextê meriv li mala xwe da xwarinê bixwe. Ev dua ser sifra xêrê û qurbanê nayê xwendinê.

Şîn û şaîya kêrn nebe

Ji dost u dijmina şermîn nebe

Xanî bê derî nebe, mêr bê serî nebe

Çîya bê kerî nebe

Avê gelîya û Kanîya ziha nebe

Nan ji xezna Şîxadî be

Havênî ji Kanîya Sipî be

Ew sifre ji sifrê celîl be

Berek'et bi gotina Biraîm Xelîl be

Em kêrn, Şîxadî t'emame



FERHENG A PEYVAN

- A'lem û quds – dinya û tiştên pîroz
A'lim – zane
Atqat – bawerî
Axret – dinya heq, dinya mayîn, dinya paşî mirinê
Bira hîm Xelîl - Pêxemberê Xwedê ku bawerîya yekxwedayî
belav kiribû. Li gorî bawerîya êzdiyan, ew ji miletê
êzdiya bû û ji şêherê Ûrfayê bû.
Birê axretê – şêx yan pîr kîjan jî ruhê mirîdê xwe derbasî
dinya dine dike
Celad – celadê sere merîya, yê ruhê merîva distîne
Cibra yîl - navê melekekîye
Cîhan – dinya
Cin – muxluqêd ku Xwedê ji agir çêkirine
Derwêş – merivekî xwedênas, qencê Xwedê
Dewa – derman
Dîn – bawerî, qanûna baweriyê
Diperêjî – qebûl dikî
Dirdayîl - navê melekekîye
Dua' – xwastina tiştêkî ji Xwedê
Dur' – chewer, kevirê ji behrê
E'zrafîl - navê melekekîye
E'zrayîl – navê melekekîye
E'badet – dua kirin, sicûde, çokvedan
Ela – Xwedê, navek ji nave Xwedê

Emîn – yê pê bawer, amin
Enzel – kevin, ji berê da
Erş û kursî – textê Xwedê, ezman
Extyar – kal, kalemêr, pîremêr
E'zazîl - navê melekekîye
Fecr – berbang, berî sibe safî be, pêşiya roj derkeve
Feqîr – derwêş, merivekî xwedênas
Ga û masî – li gorî baweriya berê dinya ser ga û masî ye
H'ebîbella – hezkiriyê Xwedê
H'ekîmî – aqilmend
H'elîm – nerm
Hewa û Adem
Hosta – dersdarê dînî
Îman – bawerî
Ins û cins – merivatî û cîn
Îsa bin Meryem – pêxemberî xristiyanan
Îsm – nav
K'afir – bêxwedê
K'erîm – dilovan
Kêmtaqet – beqewat, sist, bêtaqet
Layîq – hêja
Lewh û qelem
Mecîd – bi nav û deng
Medh – pesn, payî
Meftûl – benê reş û sor ku feqîrê êzdiyan davêjne stuyê xwe
Meh û mehr – roj û hîv
Melek – milyaket, Xwedê ji nûra xwe melek çêkirine
Melek – milyaketê Xwedê
Melik – padşa
Meqlûb – çiyakî pîroz bo êzdiya li Îraqê
Merebî – şîretkarê dînî, dersdar

Mergêh – nave cî, navê wî cî li ku jî Lalişê
 Meseb – riya dîn
 Mewla – rêber
 Mifte û k'îfil – kilfî
 Mik'ayîl - navê melekekîye
 Mikan – cî
 Milyak'et – melek
 Minetk'ar – razî
 Mirîd – şagird, merivê dixwaze Xwedê nas bike
 Mişûr – bi nav û deng, eyan, nivîsandî
 Muxliq – yê çêkirî
 Nasirdîn – navê melekekî Xwedê ye
 Nûr e'la nûr – ronaya herî mezin, nûra ser hemû nûra
 P'îr – dîndarekî êzdî, rêberekî dînê êzdiyan, terîq
 P'îrê Libnan – Şexsê ku miraza digehîne hev
 P'îşka sunetê – para sunetê
 Qasid – şandî
 Qedîm - kevn
 Qelender – derwêş û merivekî xwedênas
 Qublet – objekta meriv wextê dua kirinê berê xwe didê
 Qubletbidor – qubleta mêrê êzdî, ciyê êzdî berê xwe didinê
 wextê dua xwe dikin
 Qût – xurek
 Rafidî – yê ji rê derketî, ji riya rastî derketî
 Reh'îm – dilovan
 Sela – silav kirin
 Semed – mezin
 Şemsedîn – melekekî Xwedêye
 Sena – medh, pesin
 Şerîet – yê ne êzdî
 Şêşims - Şemsedîn

Şêx – dîndarekî êzdî, rêberekî dîne êzdiyan, merivekî zane,
 terîq
 Şêxsîn – melekekî Xwedê, şexsekî mezin di dîne êzdiyan da
 Şêxûbek'ir – şexsekî mezin di dereca derwêşiyêda, rêberê
 derwêşan û yek ji mêrêd dîwanê
 Sicadîn – melekekî Xwedêye
 Sicûde – dua' kirin, çokvedan
 Şifayet – piştgirî
 Siltan – êpîtêt, navek ku ji bo qedr şexsê mezin dîne êzdiyan
 da tê gotin
 Şimxayîl - navê melekekîye
 Şixadî – şexsê herî mezin di dîne êzdiyanda û li gorî qewlan
 sura Xwedêye û yeke ji navêd Xwedê
 Sunet – e'det, tradîsyon, edetê kevn, mîletê êzdî
 Sunî – sunet, mîletê sunetê, êzdî
 Sur' – qewata Xwedê û milyaketa
 T'awî – nexweşiya tawê
 T'ebarek – duakirî
 Tehyat – sicûde – çokvedan
 Tok – pêşîra kirasê sipî ku her êzdîk gerekî li xweke
 U'lm – zanebûn
 Vavartin – cuda kirin
 Wahdil ferz el-hemîd – tenê yekî mezin
 Xaf – xew
 Xaliq – yê dinya çêkir
 Xewas – kesê dikeve binê behrê
 Xinzîr – beraz, lê li dua'yê da merivê serhişk, merivê bê
 bawer
 Xudawendê sepehr – Xwedayê mezin
 Xwedawendê e'ta – Xwedayê dide

Xwedê – yê ev dinya çêkir, xaliq, tiştêk li dinyayê bê Xwedê
nabe


Xwerd – xwarin

Ya R'ebî – Xwedê


Yar birê axretê – alîkarê merivane bi roja axretê

Zebûn – belengaz

Zend – sax



ДӨА'ЙЕД ЭЗДИЙАН



Ль гори қанун у э'дәте мә эздыйан дба'йе сәрәкә һәнә,
к'ижан жи һәр кәсәки эзди гәрәки бьзаньбә. Һәнә мәрвь
к'ижан жи һәrr'о дба'йе көрт дьхуньн, һәнә к'ижан жи
дба' бь готьнен хвә дьбежьн у һәнә йе өса кө тексте
дба'йан бь тәмами эзбәр кьрьнә.

Бона эздыйа йа һәри мөһим у э'сәйи Шәһда Дине хвә
бьзаньбә, ль к'ижанида жи бь көртайи бәһса дине мә те
кьрьн, кө әм Хвәдайәки дьһ'әбиньн у наве хасед мә,
наве маләка у щьйе мәйә пироз те готьне. Һәр өса
варийантәкә Шәһда Дини сәр бәлги, пешьйа р'азане те
хвәндьн. Мәзьне мә готьнә кө хәв у мьрьн вәк һөвьн у
мәрвь бәри р'азе гәрәки дба' хвә бькә у рөһ'е хвә һ'әлал
бькә.

Һәр өса сәр мә фәрзә әм шәбәде сьбе зу дба' хвә бькьн у
ль бәр р'оже п'әрвәста бьн, чьмки ль гори бавәрйа мә
р'ож (тав) нура Хвәдейә. Хвәде нурә, кәси Хвәде
нәдитийә у чаха сьбе зу р'ож һьлте әм бәре хвә дьдьн
р'оже р'ожьлате у бәр нура Хвәдайе мәзьн сьшудә
дьбьн. Сьбе шәбәде Дба' Фәщре те хвәндьн у паше
Дба' Сьбе. Һәр вьса әм дба'йе хвә эваре, бәри р'ож һәрә
ава дькьн.

Эзди бона дба'кьрьне гәрәки хвә һазьр бькә, дәст у ч'аве
хвә бышо у щьван бькә, паше дәсмаләки йан к'өм бьдә
сәре хвә, дәсте расте бьдә сәр дәсте ч'әпе, бәре хвә бьдә
р'оже у п'ехвас ль сәр льнга дба' хвә бькә.

Һәр мәрвьәк дь э'мре хвәда хера жи дькә у гөна жи дькә
у әм жь Хвәде дьхвазьн гөне мә э'фу бькә, жь мә
бьбәхшинә. Бь бавәрйа мә Хвәдайе Мәзьн бь гәләк
льбаса, бь гәләк нава у бь гәләк р'әнга хвә нишани мә
кьрьйә. Эзди бавәр дькьн, кө се навед мәзьн һәнә кө мә

Хальде хвә нас кьрийә: Тавьси Мәләк, Сьлтан Эзид у Шихади.

Хвәде әв дьняа жь һәзкьрын у мөһөбәта хвә хөлөқанд, жь нура хвә һәфт мьлайак'әтед к'ьбир афьрандын у бь наве Тавьси Мәләк бу мәзьне һәму мьлайак'әта. Һәр өса жи бь наве Сьлтан Эзид жи хвә даһьр кьрийә дөма дьняа дьафьранд. Наве сьсайә мәзьн Шихадийә у бь ви нави ви р'ьйа Хвәденасьйе нишани мә кьрийә, ө'лм у занина хвә да дәсте шагьрден хвә, хас у қәләндәра, дәрвеш у вәльйан, кижана жи әв занәбуна к'ур данә мьләте мә у һ'әта нөһа әм сәр рьйа хвәденасьйе манә. Әм бь рьйа ван хас у қәнщед Хвәде йе кө Хвәде қәват у к'ьриамәт дабуна ван гази Хальде хвә дькьн. Ван әм һини дөа' кьрынә у әм пәй р'ьйа ван дьчьн һәта нөһа. У ләма дь дөа'йед мәда гәләк щар наве қәнщед Хвәде, хаса, мәләка, п'ехәмбәра те готьн. Эзиди қәдре п'ехәмбәре һәму дина дьгрьн. Дөйа'е мәда наве Бьраим Хәлил, И'са, Муса у йе дьн жи дәрбас дьбә у әв нишана ве йәксйә, кө эзиди қәдр у һөрмәте дьгрьн бона дине хәлке.

Дөа'йед эздьйан бь п'ьрани бь зьмане эзиди (көрманщи) һатьнә готьн у вәһунандьн жь альйе қәнщед Хвәде, хас у вәльйава. Һәр вьса һәнә дөа', к'ижан жи бь зьмане ә'рәби һатьнә готьн, чьки зьмане ә'рәби дь вәхте хасе мә даһьр бунә, зьманәки навмьләтьйе бу у зьмане ө'лм у хвәндьне бу. Бь бауәрйа эздьйан, мәрвь бь чь зьмани жи дөа' бькә Хвәде дөа'йед ви қәбул дькә. Ле жь бәркө әв дөа' жь альйе хасе мә да һатьнә готьн, гөнәйә әм ван бьгөһезьн у дәстәкарйе дь нав да бькьн. Һежайи готьнейә, кө зьмане дөа'йан гәләки кәвнә у фәһм кьрна мә'ньйа ван гьранә бо мәрвьен кө дәст бь һинбуне дькьн.

Дь ве пьртукеда мэ текстен дōа'йан бь се элифбэ'йан чап кьр'йа: h'эрфен эзди'к'йа кэв'ьн, латини у кирили. Мэ эв бо ве йэке кьрийэ, кō хвэндэван бькар'ьбэ хэрсэ элифба нас бькэ у к'ижан жи жера несайэ бь ван h'эрфан бьхунэ.

Эм хивидар'ьн кō эв п'ьртука Дōа'намэ бэр дэсте хвэндэванан we али'к'ар бэ бо эзд'ьед хвэйи иман у бавэрмэнд. Чэнд дōа'йед сэрэкэ мэ кьр'йэ ве пьртуке да кō хэрр'ож эзди дькар'ьн дōа'йед хвэ пе бькьн.



МЭДН'Е ХВЭДЕ¹²

Йа Р'эби, э'ла шанэк у э'ла мьк'анэк у э'ла сьлтанэк

Йа Р'эби, тōйи к'эrimi тōйи р'эh'ими

Йа Р'эби, хэр тō Хвэдайи

хэр тōйи лайици мэдh' у сэнaiи

Йа Р'эби, тō мэлэке мэлке щибани

Йа Рэби, тō мэлэке мэлке к'эrimi

Тō мэлэке э'рше э'зими

Йа Р'эби, жь энзэлда хэр тōйи рэдиmi

Тō т'ам у к'ам у р'ан

Йа Р'эби, хэр тō Хвэдайи

хэр тō h'ай

У хэр тōйи лайици мэдh' у сэнaiи

¹² Эв текст мэдh' у пэсне Хвэде дьдэ. Ээди бавэр дькын кō Хвэде йэкэ у ши эв дьнйа чекьрьяэ. хэр щарэ мэрыв дькара мэдh'е Хвэде бьдэ у эв дōа' бе хвэндьн.

Йа Р'эби, тө мэлэке ынс у щынси
Йа Р'эби, тө мэлэке эрш у к'өрси
Йа Р'эби, тө мэлэке га у маси
Йа Р'эби, тө мэлэке а'лэм у қөдси

Тө эл- сэмэди ль льфти лэмайи
Тө эл- сэмэди h'эй эл мәшиди
Wah'ди фэрз эл- h'эмиди

Йа Р'эби, тө хөдауэнде сәпәһри
Йа Р'эби, тө хуәдане мән у мәһри
Йа Р'эби, тө хөдауэнде э'тайи
Йа Р'эби, тө лайиқи мэдһ' у сәнайи

Йа Р'эби, жь исма тōйи бьльнди
Тә нә чонә, тōйи чәнди
Нәзайи нәзайи тө зәнди

Мьқадәстә дө п'айи
Тōйи лайиқи мэдһ' ө сәнайи
Йа Р'эби, тә к'әрәм дайә h'ути
Мьн дайә қөти, h'эльми мэлкути

Йа Р'эби, тө а'льме ö'льмайи
Йа Р'эби, тө һьм һ'экими у һьм мэщали
Йа Р'эби, тэ нэ хафэ, тэ нэ хвэрдэ
Хвэдан мали хвэдан п'эрдэ
Йа Р'эби, мьк'ане тэ we ль һ'эму э'рдэ

Йа Р'эби, тэ нэ лэwnэ, тэ нэ р'энгэ
Тэ нэ аwазэ, тэ нэ дэнгэ
Тэ нэ индамэ, тэ нэ ч'энгэ
Йа Р'эби, кэс ньзанэ тöйи к'öсайи

Йа Р'эби, тө wэлийе фэрза- ньмежи
Рöһ'а дыпэрежи
Жь мьлан мэлэкан дыпежи
Йа Р'эби, тө һ'акьме шаһ у гэдайи

Йа Р'эби, тө һ'акьме щьмлэти а'лэм
Йа Р'эби, тэ т'обэ данабу ль сэр Адэм
Йа Р'эби, тө һ'акьме шьфайэте
Йа Р'эби, тө рэһ'ми, к'эрэми, эмини
Йа Р'эби, тöйи эл - сэмэди, эм чö ниньн

Йа Р'эби, эзи к'этимэ йи т'авимэ

Тө һым дәрмани у һым дәвайи

Тө һым дәрмани у һым тәбиби

Тө һ'әкими, әм хәрибһн

Йа Р'эби, һәр тө дьзани дәрмане мә бь к'ө дьбэ

Йа Р'эби, тө өнсе х'өрбайи

У ль сөщ у гөнәһ у мьшәвшә

Мә кьрһн тәһ'ыйат у гәвшә

Йа Р'эби, ль мә бьбәхшә

Йа Р'эби, һәр төйи һ'ай

У тө Хвәдайи

У һәр төйи лайиқи мәдһ' у сәнайи

Йа Р'эби, тө хальқи, әм мөхльқһн

Тө мьрази, әм дахвазһн

Әм кемһн у Шихади т'әмамэ

ШӘҢДА ДИНИ¹³

Шәһда дине мьн йәк Әла,
Мәләк Шехсьн һәқ һ'әбибәлла,
Мәқлубе, Мәргәһе сәла.

Сьлаве ль Мәқлубе, ль Мәргәһе,
Ль Лальше хөдане қөбәһе, ль щьйе мәһе, бьни мәһе,
Ль ви щи, әрде Эзидхан сәр дькешә бәр Шихади
ә'бадәте у сьшудәйе.

Шихади п'адшайә,
Шехубәкьр мәвлайә,
Мьн шәһда у имане хвә бь наве ван дайә.

Шихади х'әфурә,

¹³ һәр эздики гәрәки Шәһда дине хвә бьзанбә. Бь қьрара дине эздьйан, эздьйе шәһда дине хвә ньзаньбә найе һәсабе эздики р'аст.

Мәләк Шехсүн мьшурә, Шешьмс нурә,
Мьн шәһда у имане хвә пе қәбулә.

Насърдин щәладе сәре мьнә,
Мир Сыщадин қасьде рөһ'е мьнә,
Қөбләтьлбьдор қөбләта мьнә.

К'аф у мьх'ар у Зьмзъм һ'әща мьнә,
Каньйа Сьпи мора мьнә,
Тавьси Мәләк шәһдә у имане мьнә.

Сьлтан Эзид атқата мьнә,
Шешьмс мәсәбе мьнә,
Шәрфәдин дине мьнә.

Мәләк Фәхрәдин һостайе мьнә,
..... шехе мьнә¹⁴,
..... пире мьнә,
..... мәрәбийе мьнә,

¹⁴ Ль вьрда һәр касәк наве шех у п'ир у мәрәби у териде хвә дьбежә.

..... ахрета мьнэ,

..... хӧдане мьнэ.

Мьнэтк'арьм жь мьнэте,

Эз вавартъм жь к'афьра у шәриә'те,

Әлһәмдълла у шькър, әз аветьмә сәр п'ышка сӧнәте.

Мьнэтк'арьм жь Адийа,

Эз вавартъм жь р'афьдийа,

Әлһәмдълла у шькър, әз аветьмә сәр п'ышка сӧнийа.

Мьнэтк'арьм жь мира,

Эз вавартъм жь к'афьра у вавира¹⁵,

Әлһәмдълла у шькър, әз аветьмә сәр п'ышка шех у п'ира.

Жь Адийа мьнэтк'арьм,

Бь шех у п'ир у носта у мәрәби у йар у бьре ахрете,

Бәр нав у дьк'аре Сьлтан Эзиде шьрини шәриф әзи
хӧндк'арьм.

¹⁵ Дь варьйантекида пәйва *хьнзир* те бь к'ар анин, чь жи те мә'ньа мәрвен бебавәр, сәрн'ышк у хафьл.

Чумэ Лальша нурани,

Мьн сәре хвә ль ван қоб у һълела дани,

Йа Шихади, тә к'әл у ә'мәле мьн дьзани,

Йа Хвәде у Шихади, әм кемьн, туйи т'әмами.



ДӨА' ТОКЕ¹⁶

Токә у мәфтулә, хәлатәки мәрбулә,

Ль нивәка т'ашц у *рәсул э,*
Мә бь сәре хвә қәбулә.

Шихади х'әфурә,

Мәләк Шехсүн мьшурә,

Хьдър Әйлас х'әвасе бәһ'ре к'урә.

Шешьмс ч'ьрайә у нурә,

Хвәде нур ә'ла нурә,

Мә тока хвә бь наве Тавьси Мәләк у Сьлтан Эзид
қәбулә.

Әм кемьн у Шихади т'әмамә.

¹⁶ Әв дөа' те хвәндьн чахе мәрвь паши сәршушьне кьрасе хвә ль хвә дькә. һәр эздике гәрәки кьрасе сьпи бь п'есир анкө бь ток ль хвә кә.

ДӱОА' ПЫШТГЪРЕДАНЕ¹⁷

Йа Шешьмс, мӱндэрӱкӱ хере жь тӱ дьхвазьм,

Йӱк шӱфаэт, йӱк к'ерамӱт,

Йӱк зар, йӱк зьман,

Йӱк фӱм, йӱк ацъл,

Йӱк дин, йӱк иман.

Йа Шешьмс, тӱ фӱм у ацъла дь сӱре мӱ бькӱ,

Тӱ пьрсйарӱкӱ хере ль н'але мӱ у ви мьлӱти бькӱ.

Йа Шешьмс, тӱ бьди хатьра дӱлил у хӱлила,

Алайн дӱлил,


Ахьре зӱмана Һӱсӱне зӱрбаба.

Дӱф у шьбабӱ, хас у цӱлӱндӱрӱ,

Сӱра мӱхфи не П'ьра Сӱлате.

¹⁷ ӱв дӱа' те хвӱндьне дӱма мӱрвь сьбе зу радьбӱ у кьнще хвӱ ль хвӱ дькӱ.

Дьк'ра Дьндьли рэһ'ман, Щане бьн к'эним,
Эсөдө Бэрлим,
Йа Шешьмс, мьн пышта хвэ бь тэ гьреда.



ДӢА' ФЭЩРЕ¹⁸

Мер у мэлэка дьн мэдэһ'а,

У хасед нава қобэһа,

Р'онайи дабу бэре събэһа.

Р'онайа бэре събе даһьр бу,

Бор ль э'бадэте съвар бу,

Сэд хвэзыйа ви мери бь һэқ р'авэста бу.

Ашьқ у ма'шьқ мьфтэ бь дэстэ,

Мэ мьраза хвэ жь ван дьхвастэ.

Йа рыщал ал-събаһ събаһ' ал-щэдид,

Йа мэлэк шэһид, йа нэфэс Сьлтан Эзид,

Эһэд лиһ'эд ма йурид, энтэ ал-шех, ана мурид,

¹⁸ Эв дӢа' те хвэндьн дэма мэрвь бэрбанге радьбэ, дэст у ч'аве хвэ щьван дькэ у бэре хвэ дьдэ р'ожьлате.

Ана ради к'ама энтэ т'урид,

Ал-мэфэр Сылтан Эзид.

Йа рыщал ал-сьбах' събах' ал-мышурлин,

Т'аш ал-эвлин һ'эта бь ахьрин,

Хера бьдэ, шэр'а вэргэр'ин,

Һэқ элһ'эмдылла йа Р'эбыл а'лэмин.

Фэқир ль а'ли, мир ль wəh'дане,

Йа Р'эби, т'эқабьл дуа'ина ан дуа',

Ал-му'минин ал-сальһ'ин ал-иһтийазин,

Ал-мьхфин э'ла абваб ал-хасин,

Әллаһум амин.



ДӨА' СЪБЕ¹⁹

Амин, амин,
Т'эбарэк ль дин,
Эла эһ'сэн ль хальцин,
Бь һ'имэта Шәмсэдин, Фэхрэдин,
Сьщадин, Насьрдин,
Шешьмс қәwата дин,
Сьлтан Шихади т'аше эwьлин һ'эта бь ахьрин,
Һ'эқ һ'эмдьллаһ йа Р'эбыл а'ләмин,
Хера бьдэ, шэр'а wэргэрин.
Бь рэһ'ма Шихади, рэза Мэлэк Шехсьн, к'эрэма
Шешьмс.
Нур жь нуре шьфьқи,
Сьбһ'анэ жь тэ хальқи,
Мэлэк ль бэр т'ьфьқи.

¹⁹ Эв дөа' те хwэндьн чахе мэрьв сьбе зү р'адьбэ, сьбэ сафи дьбэ ү бэре хwэ дьдэ р'оже.

Жь мале һ'эта мале,
Шешьмс хөдане сирале,
Әм ль Шешьмс набьрын хыйале.

Жь дәрәще һ'эта дәрәще,
Шешьмс хөдане фәрәще,
Әм де дәст у дамане Шешьмс тәваф бькын дь шуна
Ка'әбәтъллһайе у һ'әще.

Жь стуне һ'эта стуне,
Чәнд мьфтә һәнә ль һьндөре хәзине,
Йа Шешьмс, тә данә дәсте хөдане мә'рьфәт у насине.

Жь ч'ава һ'эта дәви,
Мора Шешьмс ле дьк'әви,
Мәйдана мәзьна жь к'әрәма наһельн бьньви.

Жь сәри һәта п'ийа,
Йа Шешьмс, тә нәршандьн данинә сәре р'ийа,
Әм жь Шешьмс набьрын һивийа.

Йа Шешьмс, тө ль мә вәкә дәргәһе рәһ'мәте,
Тә әм инабунә сәр ве хьлмәте,
Р'онайяки вехә ль бәр мә у чәнди сөнәте.

Сөни кө сөнинә,
Зәбуньн дь мандинә,
Мә бь Шешьмс һивинә.

Сөнәт кө сөнәтә,
Зәбунә кемт'ақәтә,
Мә бь Шешьмс ә'йнәтә.

Чь дөа'йа Әхтьяре Мәргәһе кьри,
Щеше Маләк Фәхрәдин, қәвалә Шихади,
Дба'қәбул П'ире Льбна,
Ван чь дөа' кьри, мә әв дөа' кьри.

Әм кемьн, Шихади т'әмамә.

ДӦА' ЭВАРЕ²⁰

Йа сьваре р'ожьлате у р'ожавайе,
Һун бьднэ хатьра доте у даие,
Һун мэ хьлас кьн жь фэдаие, жь бэлайе,
Йа Шешьмс, тӧ ль һ'але мала хвэ бьпърси у мэ жи ве
щаре.

Һун бьднэ хатьра э'рш у к'ӧрси,
Га у маси, һэйат ль кӧрси,
Йа Шешьмс, тӧ ль һ'але мала хвэ у мэ жи бьпърси.

Һун бьднэ хатьра сӧр'а лэwh' у фэлэма,
Һэва у Адэмэ, И'са бьн Мэрийэмэ,
Йа Шешьмс, тӧ ль һ'але мала хвэ у мэ жи бьпърси ль
һэму дэма.

²⁰ Эв дӧа' эваре, бэри р'ож нэрэ ава те хвэндьн.

Һун бьдън хатьра чэрх у фэлэка,

Һорьйа у мэлэка,

Сөр'а Тавьси Мэлэк у чардэ тэбэца,

Йа Шешьмс, тō пьрсйарэкэ хере ль мала хвэ у мэ жи
бькэ.

Һун бьдънэ хатьра бэһыште у даре,

К'афе у мьх'аре, сөр'а Эзид у Бэйт'ьлфаре,

Йа Шешьмс, тō пьрсйарийэкэ хере ль мала хвэ у мэ жи
бькэ ве щаре.

Һун хатьра дөр'е кьн, к'асе кьн,

Әхтьйаре сөр'а мөхфи пе П'ьра Сэлате кьн,

Йа Шешьмс, һун пьрсйарэкэ хере мала хвэ у мэ жи
бькьн.

Һун бьдънэ хатьра дөр'а сьпийэ,

Мэлэке берийэ, сөр'а Эздийэ,

Йа Шешьмс, ль диwana Сьлтан Шихади бо мала хвэ у
мэ жи бькэ һивийэ.

Һун бьднэ хатъра дӱр'а сорэ,
Эздинэ Мир у Қӱблэтълбьдорэ,
Йа Шешьмс, банг у һәварә мә бе мälәке жорә.

Һун бьднэ хатъра дӱр'а зэрә,
Ах у ав у ба у агьрә,
Эздинэ Мир у һәр чар сӱр'а,
Йа Шешьмс, тӱ ль бангина мала хвә у мә жи вәрә.

Һун бьднэ хатъра Сука мә'рифәте,
Мере ль бәр бәдле дькә хьлмәте,
Дәрвеше шәв у р'ож дькә ә'бадәте,
Шех у п'ир, һоста у мәрәби, йар у бьре ахрәте,
Йа Шешьмс, мәфәрийәке мала хвә у мә жи бькә ве
щаре.

Һун бьднэ хатъра дӱа'йед фәқира
У р'әбәнед бьне дера,
Йа Шешьмс, тӱ мала хвә у мә жи бьки сәхберә.

Нун бьднэ хатра к'орсья рэһ'мана,
Мэлэке щана, бэһ'ра қодс сьбһ'анэ,
Йа Шешьмс, мә жь тэ дьвет дин у иманэ.

Нун бьднэ хатра Ә'зрайил, Щьбрайил, Мьк'айил,
Шьфрайил, Дэрдайил, Ә'зафил, Ә'зазил,
Әвн һэр һәфт мэләкед к'ьбир,
Дэстада мьфтэ у к'ьлил,
Әw жи сәкьнин ль бэр һ'ьзрэта мэләке щәлил.

Әм кемьн у Шихади т'әмамэ.



ШӘҢДА ДИНЕ ЭЗДЫА (СӘР БӘ'ЛГИ)²¹

Сәре мьн сәр бә'лги,
Бәлгийе мьн бәре шьбаке,
Сери чумә зькаке,
Бьди хатьра Эзид у маке,
Сәре мьн қобләт, бәре мьн р'ожьлат,
Сәр мьнра сәкьни дө щәлад,
Го: „Мьскино, Таждино, бәнийо,
Шәһда дине хвә бинә,
Әзе сәре тә һьлиньм“.
Го: „Шәһда дине мьн йәк Әла,
Мәләк Шихсьн һәқ һәбиб Әла,
Мәргәйе, Мәқлубе сәла,
Сәлайе, бьнимәйе,
Щьйе Шәрқ у Шам Эздиханә ле дькә сьшудәйе
Сьшуда мә дьчә бал Шихади,
Шихади р'әдайе,

²¹ Әв варианта шәһда дини бәри мәрвь р'азә те хвәндьне.

Шешьмс мэлк'е мерайе,
Шихади сэр к'орси вэстайе,
Шәһда дине хвә һәҗ бь наве Эзид даие,
Сөнимә, сөнәтнәбимә,
Бь шех, п'ир, хоста, мәрәби, йар у бьре ахрәте мә,
Мьриде Шихадимә,
Сьлавкеше Каньйа Сьпимә,
Бь фәләма Мәләк Шихсьн ньвисимә,
Әлһ'әмдьяла, әз ездимә, жь дине хвә разимә.
Насьрдин – щәлате сәре мьнә,
Шешьмс – мәсәбе мьнә,
Лальш у Зьмзьм – һ'әща мьнә,
Каньйа Сьпи – мора мьнә,
Сьлтан Эзид – атҗата мьнә,
Шәрфәдин – дине мьнә
Тавьси Мәләк – имана мьнә.
..... – шехе мьнә,
..... – п'ире мьнә,
..... – мәрәбийе мьнә,
Рәһ'мә ль де у баве хоста.
Әм кемьн, Шихади т'әмамә.

ДӨА' СЬФРЕ²²

Йа Р'эби, тө дайими, тө к'эрими
Тө рәһ'ими, тө мөлке әрше ә'зими
Жь эзәлда тө қәдими
Хвәдео, тө һәфте у дө мьләти бейи рәһ'ме
Сәре сәр бә'лгийя, гьртие һ'әбсийя
Р'ешийе р'ийя, к'әсиб, бәлэнгаз у ехсира,
Мә жи пера.
Һун бь маш бьн, бь бәрат бьн, бь хәлат бьн,
Бь көр у қиз у мал у дәвләт бьн,
Бь иман у әрк'ан у ахрәт бьн,
Хәм нәби, дәм нәби,
Рьзге вә у һадьр-гөһдера кем нәби,
Сийар буйи пәйя нәби,
Йа дити мәһрум нәбә,

²² Әв дөа' те хвәндьн паши хварьне вәхте мәрьв ль мала хвә да хварьне бьхвә. Әв дөа' сәр сьфра хере у қөрбане найе хвәндьне.

Шин у шайя кем нэбэ,
Жь дост ө джъмьна шәрмин нэбэ,
Хани бе дэри нэбэ, мер бе сэри нэбэ,
Чийа бе кэри нэбэ,
Аве гэлийа у канийа зьһа нэбэ.
Нан жь хэзна Шихади бэ,
Һавени жь Канийа Сьпи бэ,
Әү сьфрә жь сьфре щэлил бэ,
Бәрәк'әт бь готьна Бьраһим Хэлил бэ.
Әм кемьн, Шихади т'әмамә.



ФЭРЬЭНГА ПЭЙВАН

А'лэм у қодс – дьһиа у тыштен пироз

А'льм – занә

Атқат – бавәри

Ахрәт – дьһиа һ'әқ, дьһиа майин, дьһиа паши мьрьне

Бьраһим Хәлил - П'ехәмбәре Хвәде кә бавәрьһа
йәкхвәдаи бәлав кьрьбу. Ль гори бавәрьһа
эздьһан, әв жь мьләте эздьһа бу у жь шәһәре
Урфайе бу.

Бьре ахрәте – шех йан п'ир к'ижан жи рөһ'е мьриде хвә
дәрбаси дьһиа дьһн дькә

Вавартьһн – щөда кьрьһн

Га у маси – ль гори бавәрьһа бәре дьһиа сәрг га у маси йә

Дәа' – хвастьһна тыштәки жь Хвәде

Дөр' – щһәвәр, кәвьре жь бәһре

Дәва – дәрман

Дәрвеш – мәрвьәки хвәденас, қәнще Хвәде

Дин – бавәри, қануна бавәрьһе

Дьпэрежи – қэбул дьки
Дьрдайил - наве мэлэкэкийэ
Ә'бадәт – дөа' кьрын, сьшудә, чоквәдан
Ә'азил - наве мэлэкэкийэ
Ә'зрайил – наве мэлэкэкийэ
Ә'зрафил - наве мэлэкэкийэ
Әла – Хwәде, навәк жь навә Хwәде
Әмин – йе пе бawәр, амьн
Әнзәл – кәвьн, жь бәре да
Әрш у к'өрси – т'әхте Хwәде, эзман
Әхтйар – кал, каләмер, пирәмер
Зәбун – бәләнгаз
Зәнд – сах
И'са бьн Мәрийәм - П'ехәмбәре христйана
Йа Р'әби – Хwәде
Йар бьре ахрәте – алик'аре мәрьянә бо р'ожа ахрәте
Иман – бawәри
Исм – нав
К'әфьр – бехwәде
К'әрим – дьлован
Кемтақәт – бәқәват, сьст, бетақәт

Лайиқ – нежа
Ләwh у қәләм
Мөхльқ – йе чекьри
Мәқлуб – ч'ьйаки пироз бо эзд'яа ль Ирақе
Мәwла – р'ебәр
Мәдһ' – пәсн, пайи
Мәләк – мьл'яак'эт, Хwәде жь нура хwә мәләк чекьрьнә
Мәләк – мьл'яакәте Хwәде
Мәльк – п'адша
Мәһ у мәһр – рож у һив
Мәргәһ – наве щи, наве wi щи ль кә жи Лальшә
Мәрәби – ширәтк'аре дини, дәрсдар
Мәсәб – р'ьйа дин
Мәфтул – бәне рәш у сор кә фәқире эзд'яан давежнә
стөйе хwә
Мәшид – бь нав у дәнғ
Мьк'айил - наве мәләкәкийә
Мьк'ан – щи
Мьл'яак'эт – мәләк
Мьнәтк'ар – р'ази
Мьрид – шагьрд, мәрьве дьхwазә Хwәде нас бькә

льфтэ у к'ылил – к'ылит

льшур – бь нав у дэнг, э'йан, ньвисанди

льсьрдин – наве малэкаки Хвэдейэ

р э'ла нур – р'онайя һәри мэзын, нура сәр һәму нура

лм – занэбун

ир – диндарэки эзди, р'ебэрэки дине эздыйан, тэриц

ире Льбнан – Шәхсе кө мьраза дьгәһинэ һәв

ышка сөнәте – п'ара сөнәте

фьди – йе жь ре дәрк'әти, жь р'ыйя р'асти дәрк'әти

һ'им – дьлован

нэг – әдәт, традисийон, ә'дәте кәвн, мьләте эзди

ни – сөнәт, мьләте сөнәте, эзди

р' – қәвата Хвэде у мьляакәта

ла – сьлав кьрын

мэд – мэзын

на – мәдһ', пәсын

тан – эпитет, навәк кө жь бо қәдр шәхсе мэзын дине
эздыйан да те готын

бдә – дөа' кьрын, чоквәдан

адин – малэкаки Хвэдейэ

ти – нәхвәшьйя т'awe

Т'эбарэк – дōа'кьри

Тәһйат – сьшудә – чоквәдан

Ток – песи́ра кьрасе сьпи кō һәр ездик гәрәки ль хвәкә

Фәқир – дәршеш, мәрвәки хвәденас

Фәщр – бәрбанг, бәри сьбә сафи бә, пешьйа р'ож дәркәвә

Хōдашәнде сәпәһр – Хвәда́йе мәзын

Хвәдашәнде ә'та – Хвәда́йе дьдә

Хвәде – йе әв дьнйа чекьр, хальқ, тыштәк ль дьнйа́йе бе
Хвәде набә

Хвәрд – хварьн

Хальқ – йе дьнйа чекьр

Хаф – хәw

Хәwас – кәсе дьк'әвә бьне бәһре

Хьнзир – бәраз, ле ль дōа'йеда мәрвәе сәрһышк, мәрвәе
бе бавәр

Һ'әкими – ақьлмәнд

Һ'әлим – нәрм

Һәwа у Адәм

Һәбибәлла – һәзкьрьйе Хвәде

Һоста – дәрсдаре дини

Шех – диндарэки эзди, р’ебэрэки дине эздъян,
мэрвэки занэ, тэриқ

Шехсын – мэлэкэки Хwэде, шэхсэки мэзын дь дине
эздъян да

Шехубэкър – шэхсэки мэзын дь дэрэща дэрwешъйеда,
р’ебэре дэрwешан у йэк жь меред диwane

Шешьмс - Шэмсэдин

Шэмсэдин – мэлэкэки Хwэдейэ

Шэриэт – йе нэ эзди

Шихади – шэхсе һэри мэзын дь дине эздъянда у ль гори
qэwлан сөр’а Хwэдейэ у йэкэ жь навед Хwэде

Шьмхайил - наве мэлэкэкийэ

Шьфайэт – пыштгъри

Щалад – щаладе сэрэ мэръя, йе рöh’е мэрва дьстинэ

Щиһан – дьһия

Щьбрайил - наве мэлэкэкийэ

Щьн – мөхлөqed кö Хwэде жь агър чекърьнэ

ьнс у щьнс – мэрвати у щьн

Qöблэт – обжэкта мэрвв wэхте дöа кърьне бэре хwэ дьде

Qöблэтбьдор – qöблэта мере эзди, щье эзди бэре хwэ
дьдьне wэхте дöа’ хwэ дькьн

Qасьд – шанди

Qәдим - кәвн


Qәләндәр – дәрвеш у мәрвәки хвәденас

Qут – хөрәк

Wаһдъл фәрз әл-һәмид – тәне йәки мәзын



ᐱᐱᐱᐱᐱ ᐱᐱᐱᐱᐱ



ቅጠራ ቅጠራ

ኒብሉግግ ስጋ > ኒብሉግግ ስጋ > ኒብሉግግ ስጋ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራ > ነባ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራ > ነባ ነባ ነባ ነባ .ቅጠራ ነባ

.ቅጠራቅጠራ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራቅጠራ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራቅጠራ ቅጠራቅጠራ ነባ
.ቅጠራቅጠራ ነባ ነባ ነባ x .ቅጠራ ነባ

.ቅጠራ > ስጋ > ስጋ ነባ
.ቅጠራ > ነባ ነባ .ቅጠራ ነባ
ቅጠራ ነባ ነባ
.ቅጠራ > ነባ ነባ ነባ ነባ >

.ቅጠራ > ስጋ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራ > ስጋ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራ > ስጋ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ
.ቅጠራ > ስጋ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ

.ቅጠራ ነባ ነባ ስጋ ቅጠራቅጠራ ነባ
.ቅጠራቅጠራ ነባ ነባ ቅጠራቅጠራ ነባ
.ቅጠራቅጠራ ነባ ነባ ነባ

.ቅጠራቅጠራ ቅጠራቅጠራ ነባ .ቅጠራ ነባ

.Լօճ՝ Գրօճ ԳԼճԻՎ > ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.Լօճ ԲՈՅ Ե ՁՎՆԻՄ ՕՆՅԷ ՕԴ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ԳՂՈԳԼԹ ԳԼճԻՎ > ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ԳՍԳԼՕ .ԳԼԳՈՅՋ .ԳԼՎՈՒՆ > ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ՍՍԳՍ > ԼՕ .ԳԲՕԼՕՄՄ ԳԿԴ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ

.ՕԼԳՂԷ Գ ՕԼԳՂՕՋ ԳԿՕ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ԳԼՅՕՄ ԼՑ > ԳՍԼԼՈՄ ԼՑ > Դ
.ԳՎԳՎՕԴ ԼՑ > ԳՍԼԼՈՄ ԼՑ > Դ

.ՍՎԳՈՑ# ԼՕ .ԳԼԳՋՕՍ > Դ
.ՕՄ > ՋՋ Վ ՕԼ ԳՍԼԼՈՄ ԳՍԿՄ > Դ ՈՑԾ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ԳԼՎՈՎ# ԳՄՄՄ > Դ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ

.ՕՄՅՕՄԼ > ՑՕՍՂՂ > ՏՅՄ > Դ
.ՕՄՅՕՂ > ԴԼԳՎՕԴ ՍՈՋ ՕԼ
.ՕՄՅՕՆՎ ՕԼ Ե > Դ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ

.ԳԼՎ ԳԿԴ ՈՑԾ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ԳԼՂՑ > Դ > Դ
.ԳԼՍՕՄ > ՎՄՕԼ ԳԴԳԼԵ ԳԿԴ ՈՑԾ > Դ
.ՍԴԵԼ ԼՕ .ԳԴԼԻՑ > Դ .ԳՎՈՒՆ ԻԳ
.ՍԿԼՅՈՄ ԼՕ .ԳԿԼՈԼ > Դ

.ԳԼԼԼՕԷ ԳԿԴ .ՍԼԳՋ ԼՕ .ԳՄԼՅԳՄ ԻԳ

գարգա Լեռոմ

.ժվվլ չօղ ւլ զարգա Լեռոմ

.ժվվլ Վրո՞՞ Դօ՞՞ սաճճիտ չօլօլ

.Լյօա զժօճոճ .զվճլլօլ

.զժօճոճ Լ .զվճլլօլ Լ զ/Լյա

.զժօլ զս .զժօլ զճ Լ .զժօն>Կ զսմաճ զիվլլ Լ

զսաճա > զիճվլ զժճճիտ ոսն օտճլլն ոսա սճճճճի զիճվլ .զճ զճ Լ

.օղմա՛՛ զժճճիտ

.օլլօլ ոչօնճճիտ

.օղմ սճ Վ >ճ զսլլճի > Լեռոմ ւլ

.օռնլօ# զժճճիտ

.օռնլ սաճճիտ չօլօլ

.օռնլ ալմճիտ

.օլնօԿ զճ >ճ զսլլճի > Լեռոմ ւլ

.օլ զիճա զմլլօճ սճճալս

.օլ Լօճ զիճալ սճճալ ոճլ

.օլ ԼիլլօԿ ոռնսլլիլլօԿ

.օլ Լօ՞՞ ԼԼԼ > ոլ#Լ > Լլլ

.օլ Լոճ զճա Լզսլլ

.օլ զսլլճի > օժօմ չօլօլ զաճիլ

.օլ Լիլլի ճճճի սիլլա

Պէտքեր և անհոգ

.անհոգ > անհոգ
.անհոգի անհոգի
.անհոգ > անհոգի անհոգի
.անհոգի անհոգի անհոգի

.անհոգի անհոգի
.անհոգի անհոգի անհոգի
.անհոգի անհոգի անհոգի անհոգի

.անհոգ > անհոգի անհոգի
.անհոգ և անհոգի անհոգի
.անհոգի անհոգի անհոգի անհոգի անհոգի

.անհոգի անհոգի > անհոգի և



Պէտքեր և անհոգ

.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի

.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի անհոգի

.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի անհոգի

.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի

.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի
.անհոգի և անհոգի անհոգի անհոգի

ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl

ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl
ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl
ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl
ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl
ḥmōl ḥmōl ḥmōl ḥmōl





ԳՎԻՆ ԼՈՅՑ

.սգևի .սգևի
 .սգթ քօնօնու
 .սգթ յիճ յ սօսալ ի յի
 .սգթօրնօւ .սգթօլօւ ի յօլօթ v
 .սգթօնս .սգթօն
 .սգթ ի յօթ անօթ
 .սգթն v ի յօս սգևի գօն գօնօթ սի յի
 .սգթօլն յօն ի գ ի յի յօլօթ Կօթ
 .սգթօնօն ի նօն .օսն ի նօն
 .անօթն ի նօն ք .սաճօթ քօլօլ ի օն .գօնօթն ի նօն v

.գԳՄ գրնս և և ռնս
 .գԳՄՅ օր և և օսնօն
 .գԳԿ ռօն յ քօլօլ

.գլի ի յօս գլի և
 .գլիԳն գլնօն անօթն
 .գլիգն սոնս անօթն յ լօլ

.գօնօն ի յօս գօնօն և
 .գօնօն գլնօն անօթն

ԳՅՈՍ > ԳՅՈՍՆՈՎԻՅ ԼՈՅՑ Ե ՍԶՆ ԱՆՅՆ ԳՅՈՍՆՈՎԻՅ > ԳՅՈՍ ԳՅՈՍ

.գնօն ի յօս գնօն և
 .գնօն գնօնս յ օնօն օրն և և և

...ol Բսխաճ ԲԴԿԻՍ օԴ . ԿԼԻԿԻՄ ԻԲ

...ոս ԻԴՍԵ ԻՂԻԿ ԿԻ
...քն ԲԻ ԿԼԻԿԻՄ ԻՌՏԼ
...ԼԻ ԼԼՈՌՈՋ ԿԻ ԼԿՈԼ ԼԼԻԲՈԼ


ԲԻ ԻԴՍԵ ԲԴՈՍ ԿԻ
...սԳՍԻՍ ԿԼԻԿԻՄ ԻԲ
...ՍՈՒՄ ԿԼԻԿԻՄ ԿԻ ԼՈԻ

...ոս օՋՕՂ ՕԼ ԵՂ . ԿԼԻԿԻՄ ԻԲ
ԲԻ ՌՈՍ ՕՍՆՎԵԳԻ ԼՈԻ օԴ
Կ ԵՂ ՌՈՎ ԵՂ ՕՃԲԻ ԲՋԲԼԿՈՒ

...սԳՍԻՍ ԵՋ ԲԼԿԿ
...ԲՈՒՄ ԵՂ ՍՍՆՎՈՑ
ԲԻԲՏ ԿԼԻԿԻՄ ԿԻ ՕԼ

ԲԼԿԿ ԵՋ ԴՈՒՄ
ԲԻԲՏ ԼԲՋ ՕՍՆՎՈՑ
...ԲՈՒՄ ԿԼԻԿԻՄ ԿԻ ՕԼ

...ԿՈԼ ԲՈՒԲԴՅՈՒ ԻԲԼԿ
...ՍԳՍԻՍ ԵՂ ԼՈԼ ԲՈՒԳՏ
ԵՂ ԲՈՒԳՏ ԵՂՍՈՒԿԿ
ԼՈԻ ՕԼ . ԲՈՒՋ ԼԿԿ ԿՍԻԶ
ԵՂ ԲՈՒՅԲՈՒ . ՍԼԲՋ ԼՈԻ



Handwritten text in a cursive script, likely a letter or a page from a manuscript. The text is mostly illegible due to fading and blurring.



Handwritten text in a cursive script, continuing from the top section. The text is mostly illegible due to fading and blurring.



.jqj'xl .jqj'fns .jqj'fns fofj'f ofns xax
.jq'fns .jq'fns .jq'fns .jq'fns
.jq'fns .jq'fns .jq'fns .jq'fns
.jq'fns .jq'fns .jq'fns .jq'fns
.jq'fns .jq'fns .jq'fns .jq'fns

.jq'fns .jq'fns .jq'fns .jq'fns



ԳԽՂՈՎ ՈՏԻ ԻՉ ԳԻՐՈՎ ԼԵՐՈՒՄ

.գԽՂՈՎ ՈՏԻ ԱԼ ԳԻՐՈՒՄ
.ԳՋԻՄՈՎ ԳԻՐՈՎ ԱԼ ԳԽՂՈՎ
.ԳՋԻՋԵՆՈՎ ԵՐԱՅԵՐ
.ԳՋԻԼ ԵՐԱՅԵՐ ԵՐԱՅԵՐԻ ԻՆՏԵՐՆԱԿԱՆ
.ԴԻՂՈՒՄՆԵՐ ԱԼ ԳԻՐՈՎ .ԴՈՒՄՆԵՐ ԱԼ ԳԻՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԻՆՏԵՐՆԱԿԱՆ ՈՏԻ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ .ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ .ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ :ՃԽ
.ԵՐԱՅԵՐ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԼԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԱԼ ԳԻՐՈՎ ԼԵՐՈՒՄ :ՃԽ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ .ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ .ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ
.ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ ԵՐԱՅԵՐՈՒՄ


- .ሀይ ሻቦሠ ሻቦጋፊ
- .ሀይ ሻቦሠሀይ ሠጠሻጠ
- .ሀይ ገፊፍ ገገገ > ጠጋጋ
- .ሀይ ጠገገ ሻጌ ገሻጌ
- .ሀይ ገገገገ ሻገገ ሠገገገ
- .ሀይ ሻገገ ሠገገገ
- .ሀይ ሠገገገ ጌጌጌ ሻጌጌጌ
- .ሀይ ሻጌጌጌ
- .ሀይ ሻገገገ
- .ሀይ ሻገገገገገ
- .ገገገገ ሻገገገ > ሻገገ ጋ ሀይገገገ
- .ሀይገገገ ሻገገገገ > ሠገገገ ገገገ

- .ሀይገገገ ሻገገገገ > ሠገገገ ገገገ



சென்னை

பெயர்	வயது	பாலம்
செ. சிவசுந்தரி	24	செ
செ. சிவசுந்தரி	26	செ
செ. சிவசுந்தரி	28	செ
செ. சிவசுந்தரி	30	செ
செ. சிவசுந்தரி	32	செ
செ. சிவசுந்தரி	34	செ
செ. சிவசுந்தரி	36	செ
செ. சிவசுந்தரி	38	செ
செ. சிவசுந்தரி	40	செ
செ. சிவசுந்தரி	42	செ
செ. சிவசுந்தரி	44	செ
செ. சிவசுந்தரி	46	செ
செ. சிவசுந்தரி	48	செ
செ. சிவசுந்தரி	50	செ
செ. சிவசுந்தரி	52	செ
செ. சிவசுந்தரி	54	செ
செ. சிவசுந்தரி	56	செ
செ. சிவசுந்தரி	58	செ
செ. சிவசுந்தரி	60	செ



ELĪFBE / ЭЛИФБЭ

Latīnī	K'irīlī	Ēzdīkī
Aa	Аа	।
Bb	Бб	∨
Cc	Цц	Δ
Çç	Чч	∇
Ç'ç'	Ч'ч'	∇
Dd	Дд	□
Ee	Ээ	○
E'e'	Э'э'	∟
Êê	Ее	▣
Ff	Фф	⊥
Gg	Гг	×
Hh	Һһ	⊗
H'h'	Һ'һ'	∇
Ii	Ьь	-
Îî	Ии	▣
Jj	Жж	×
Kk	Кк	⋈
K'k'	К'к'	⋈
Ļļ	Лл	∟
Mm	Мм	∟
Nn	Нн	∟
Oo	Оо	∨

Pp	Пп	≥
P'p'	П'п'	∖
Qq	Qq	т
Rr	Pp	п
R'r'	P'p'	п̄
Ss	Сс	ш
Şş	Шш	ш̄
Tt	Тт	т̄
T't'	Т'т'	⊥
Uu	Öö	>
Ûû	Уу	>>
Vv	Вв	∕>
Ww	Ww	≥
Xx	Хх	δ
Yy	Йй	φ
Zz	Зз	<



DUA'YÊD ÊZDIYAN

PÊŞGOTIN	8
MEDH'Ê XWEDÊ	9
ŞEHDA DÎNÎ.....	14
DUA' TOKÊ.....	18
DUA' PIŞTGIRÊDANÊ	19
DUA' FECRÊ.....	21
DUA' SIBÊ	23
DUA' ÊVARÊ.....	26
ŞEHDA DÎNÊ ÊZDIYA (DUA' SER BELGÎ)	30
DUA' SIFRÊ.....	32
FERHENG A PEYVAN.....	34

DÖA'YED EZDIYAN

ПЕШГОТЪН.....	40
МӘДҺ'Е ХВӘДЕ	44
ШӘҺДА ДИНИ	48
ДÖА' ТОКЕ.....	52
ДÖА' ПЬШТГЪРЕДАНЕ.....	53
ДÖА' ФӘЩРЕ	55
ДÖА' СЪБЕ	57
ДÖА' ЭВАРЕ.....	60

ШӘҲДА ДИНЕ ЭЗДЬЙА (СӘР БӘ'ЛГИ).....	64
ДӖА' СЬФРЕ.....	66
ФӘРҲӘНГА ПӘЙВАН.....	68

УЛҚОСҚИ ОҚИЛАС

қанда қанол.....	76
қуқас исом.....	79
қззҗ Ила.....	82
қисқиқжжз Ила.....	83
қисол Ила.....	84
қив Ила.....	86
қил/қи Ила.....	88
қжлов нолв Иқ қуқас исом.....	92
қилв Ила.....	94
ELIFBE / ӘЛИФБӘ	96





Publishing House "UNIVERSAL"

19, I. Chavchavadze Ave., 0179, Tbilisi, Georgia ☎: 2 22 36 09, 5(99) 17 22 30

E-mail: gamomcemlobauniversal@gmail.com; universal505@ymail.com

